

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Xebat ji bo* :

*** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.**

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar (108)* *Sal 20 Avdar 2015z - 2627k* *Buha (50)L.S*

## Li Sûriyê! Çar Salên Xwînî !

▪ **Rozad Elî**

Çar sal derbas bûn û gelê Sûryê li pêş çavên civaka navnetewî di xwîna xwe de digevize. Şerê navxweyî ter û hişk daye ber xwe dişewtîne û welêt serûber wêran dike.

Li gora amarên dezgehên navdewletî, di van çar salan de dora 300 hezar mirovên Sûrî hatine kuştin. Jê derdora 225 hezaran kesên sîvîl û çekdarên rikberê ne, û dora 75 hezarî jî leşkerên dewletê û milîsên pê ve girêdayî ne. Amar didin xuyakirin jî ku bêtirî milyonek kes birîndar bûne, û rêjeyek bilind ji wan ketine rewşa kêmendamtiyê û pêdviyên taybet jê re gerek in.

Amar dibêjin jî, ku dora yanzde milyon welatiyên Sûrî ji cih û warên xwe hilbûne û bûne penaber; jê dora pênc milyon û şeş sed hezarî li hundirê welêt belav bûne û bêtirî çar milyonan jî li paş sînoran bûne penaber. Piraniya wan penaberan xanî û arzûyên wan wêran bûne, .... ❷

## Careke Din ... Avdar û Newrozê Reş Girêdan



▪ **Merwan Berekat**

Di dîroka gelê Kurd û nemaze di ya nûjen de, miha Avdarê ya şahî, cejin û çalakiyan e. Lê di wê de gelek bûyerên tirajîdî jî bi ser Kurdan de hatine, û jan, derd û birînên kûr di rojimêra kurdî de tomar kirine. Ango, dema Kurd dibêjin Avdar; rast e; berî her tiştî cejna Newrozê û şahiyên wê tên ber çavên wan, lê li aliyekî din, tabloya Avdarê rengên şîn û bêzariyê ye. Ji wan rengên xwînî bombebarankirina Hîroşîma .. ❸

## Newroza Pakrewanan

Cejna Newrozê li ba gelê Kurdistanê wate û reng û dengekî xwe yî cuda heye. Ew li ba gelê Kurd bûye şan û sembola rizgarî, serkeftinê, xebat û berxwedana ji bo azadî û aştiyê. Loma jî, di bin hemî merc û nîran de, çi bi dizî yan eşkere be, gelê Kurd wê li dar dixe, pê şa dibe û hebûna xwe û mafên xwe yên netewî diyar dike.

Îsal jî, di nava hemî rewşên dijwar yên welêt û gelê me de, Kurdistaniyan li şeva Newrozê, li seranserî welêt Newroza xwe li dar xistin, agirê wê yê pîroz vêxistin û şahiyên xwe gerandin.

Bi boneya Newroza pîroz,. ⓫

**Li Sûriyê! … Dûmahîk**

karûbar kavil bûne û bi kelûpelên dezgehên hawarçûnê dijîn.

Serhejmar dibêjin jî, ku nêzîk du milyon zarokên Sûrî bê xwendin û li derveyî dibistanan mane, û bi sed hezaran xwendekarên hemî astan , ji xwendinê dûr ketine.

Di warê xizmetguzariyê de jî, piraniya welatiyan ji gelek pêdviyên xizmetguzariyê bê par mane, mîna kehrebe, av, xwarin, xizmetguzariyên din û jiyaneke pir dijwar derbas dikin. Ji bilî ku dora 450 hezar kesî di bin dorpêçkirineke zor giran de ne, û pêdviyên jiyanê yên bingehîn peyda nabin û bi mirinê re rûbrû ne.

Li roja ku ew çend xwepêşanderên destpêkê li kolana Hemîdiyê li bajarê Şamê meşîn û banga azadî û demoqrasiyê kirin, bê guman wan bi niyazeke pak û dadwerî banga xwe hildan; wan guman ne dikir, ku sazûman li şûna ku bi çavekî hişmendî û erênî li wan daxwazên rewa binêre, ewê bi siyaset û kiryarên xwe yên çewt û dûrhişî, Sûryê bajo ser kortaleke ji êgir û barûtê.

Ji destpêkê de sazûmanê xwest, ku ew çalakiyên gelêrî yên aştiyane bi aliyê çekdariyê de têvede, da behane bikevin destê wê, û ew jî çekan bi şêweya ku dixwaze bi kar wîne. Li wê demê hinek komên rikberê yên sergerm û destine derve jî, ji bo wê pilanê bûn alîkar, û herwiha pilana sazûmanê bi cih hat



" Hilweşandina Kobaniyê "

û Sûryê bi tavahî bû meydana ev şerê qirêj û demdirêj.

Roja îro, piştî çar salan ji şer, û piştî ewqas qurbanî, kavilî, penaberî û wêrankirina jiyanê li seranserî Sûryê, roja îro hemî aliyên şer, sazûman, rikber û dewletên li paş wan jî, dupat dikin ku di ev şerê navxweyî de kesek wê bi ser nekeve; gihîştine wê baweriyê jî ku çareserî tenê wê di riya hevpeyvîn û lihevkirin û çareseriyên siyasî re be.

Lê zor mixabin, derfetên çareseriyê yên ku berî çar salan hebûn, îro bi hêsanî bi dest nakevin. Eger li wê demê rikber û sazûman bi serê xwe bûn, û kanîn biryarên xwe bi xwe bistandana, roja îro gelek dest ketine nav qeyranê û çareseriyan jî.

Ji bilî ku ev şerê çar salan, birînên pir kûr di civaka Sûrî de vekirine û her rojê kûrtir dibin û dizengirin; wan civak bi gelek tiştan ji hev perçe kirine û hîn jî berdewam in, nîvê welêt bi xelkê wê ve şerpeze kirine û nîvê din jî kirine dîl û bêçare. Lê tiştê herî giring û xedar serîhildana nakokiyên bineolî Sunne-Şî`e ye. Her du aliyan, sazûman û rikberê, destê xwe avêtin ew pirsa pir nazik û kirine xizmeta armac û berjewendiyên xwe û gelê Sûryê dajon ser qedereke zor xirab.

Sazûman jî dizane û rikberî jî dizane, ku gelê Sûrî her katê û her rojê buhayeke pir mezin ji xwîn û paşroja xwe dide. Pir gerek û pêwîst e jî, ku hemî aliyên ev şerê navxweyî yê qirêj li xwe vegerin, şer rawestînin û dest bi hevpeyvîn û danûstandinan bikin.

Zor pêwîst e jî, ku hemî derfetên çareseriyên aştiyane, çiqas biçûk bin jî, bi erênî werin birin, ji pilana De Mêstora û hevdîtinên Mosko de bigire û ra digihê Kongireyeke Cinêvê ye din. Yan jî Sûryê wê ji dest hemiyan here, bibe gola têrora navdewletî û bi dehan nîv dewlet, rub dewlet, dewletên bajar û gundan wê mîna balûkan lê derkevin. Ev jî ne li gor berjewendiyên herêma Rojhilata Navîn û cihana pêşketî ye; û bêguman ne li gor berjewendiya gelê Kurd e jî, çinkî em bixwazin û nexwazin, em Kurd wek gel û doz, xelekeke lawaz in di ev rewşa Sûriyê ya pir aloz de. Û em ji hemiyan bêtir dozdarên aştî û aramiyê ne.



" Li Hesekê , şeva Newrozê "

**Careke Din … Dûmahîk**

Kurdistanê– Helebça, Enfal, bidardekirina kurdperwerên Rojhilatê Kurdistanê û kiryarên rêjîma Elbe`s ên hovane di Avdara 2004an de û... HWD, ew jî li bîra Kurdan tên.

Hertim dijminên azadiya gelan, û li ser serê wan yên azadiya gelê Kurd, hewil dane her tiştên ku pêwendiyên wan bi azadiyê re hebin çi cejin, tevger, sazî û…, ne tenê şerê wan bikin, û hewildana tunekirina wan jî kirine, û hîn jî ev mejî û nemirovatiya wan berdewam e. Lê dema miletek an mirovek doza azadiya xwe dike, tu hêz nikarin pêlên vîna wî rawestîne, ji ber ku tiştek ji azadiyê rûmetir nîne.

Careke din, jînkujer û terorîstên mejîtarî kiryarên xwe yên hovane û xwînî di şahiyên Newroza serkeftina Kobanê de, li bajarê Hesekê, li Taxa Miftî bi kîndarî di dermafê hezkiriyên azadiyê de kirin. Bi dehan dilsozên Newroza azadiyê şehîd ketin, di nav wan de kalemêr, jin û zarok jî hebûn, û zêdetirî sed û pêncî jî birîndar bûn.

Bê guman! ev êrişa terorîst ne tenê li ser gelê Kurd û şahiyên cejna Newrozê ye; ew li dijî mirovatî, aştî, azadî û hemî piştgiriyên azadiya gelan û her kesê ku doza aramî û wekheviya di navbera pêkhateyên vî welatî de dike, hatiye kirin. Ji ber ku tundrewî û pêgirên wê, ne tenê dijîtiya civakekê, olekê yan jî neteweke dikin, ew dijîtiya mirovatî, şaristanî û jînê jî dikin, û kiryarên ku pêgirên vê ramanê li Rojhilata Navîn, û hin welatên cîhanê dikin, vê rastiyê teqez dikin.

Ev nexweşiya pîs û qirêj, û mikrobên wê yên kujer, eger ji kok de netên rakirin, ewê pir sînoran derbas bikin, û encama wê xwîrijandin, nearamiya cihanê û hilweşandina civakan e. Ji ber wê jî, zor pêwîst e, ku hemî hêzên cîhanî yên azadîhez, mirovperwer û xemxwerên aştî û wekheviyê, nemaze yên ku amûr û hêza karîbûnê li ber destên wan hene, ku bêderengî ev nexweşiya xedar ji laşê civaka mirovahiyê rakin, û eger nekin jî nirxdayîn dê pir giran be.

Ji aliyekî din ve, ev kiryara terorîst û hovane, ya ku tu cudatî ne xistibû navbera jin, mêr, zarok û kesên leşger, tenê armac ew bû, ku yên li wê şahiyê kom bûbûn, û cejna Newrozê pîroz dikirin Kurd bûn. Belê; ji kîjan partiyê, encûmenê, saziyê û rengî dibe, li cem çeteyên terorîst û jînkuj ne xem û ne pirsgirêk e, tenê ji ber ku em Kurd in, ewan kuştin û tunekirina me ji xwe re rewa dibînin. Lewra jî, êdî bes e, divê em nameyên dijmin û xêrnexwezên gelê Kurd baş raçav bikin, ku hemî Kurd û hebûna me armanca kiryarên wan yên terorîst in, û hertim ew li fersendan digerin, ku talana me bajon. Ji ber wê jî, her ku lihevkirin û yekrêziya Kurdan, nemaze ya Tevgera Siyasî dereng bimîne, ewqas xweparastina me jî lawaz dibe, û belkî kiryarên terorîst û xwînî yên wek a şeva Newroza taxa Miftî carine din jî çêbibin. Hîngê ne lome, ne partîtî û ne jî pir û hindikbûna kursiyan sûdê dikin. Di baweriya me de, eger hevpeymana Duhokê hatiba cêbecêkirin û li gor bendên wê Lêvegera Siyasî kar û xebata xwe ya piratîk kiriba, belkî ev kiryara terorîst nebûba, û Newrozê reş nedaba ber eniya xwe. Ya din; îro roj zor pêwîst e, ku em Kurdên Rojavayê Kurdistanê nakokiyên navxweyî bidine aliyekî û hêzên xwe yên leşgerî xurt û berfirehtir bikin, ta ku em bikaribin baştir gel û axa xwe ji hêzên mejîtarî û tundrew biparêzin, û ta ku em bikaribin Naweroza xwe, sembola azadî, aştî û wekheviyê bi şahî û dilşadî pîroz bikin.

Di dîroka nûjen de, bi dehan Ezdehak, enfalkar, jînkuj, nijadperest û şûfînên netewperest, bi pilan, pîlan û kiryarên xwe yên xwînî xwestin agrê Newroza azadî û aştiyê vemrînin, û gelê Kurd di nav civak û netewên xwe de bihelînin, lê her Newroz ma û sal bi sal agirê wê gurtir û bilindtir bû. Û her Kurd reseniya mirovhezî, aştî û azadiyê vedijînin û dê her jî were vejandin.

# Bila Nebêjin Em Gerînendeyê Delûbê Ne!

Memê Alan

Di karnava şoreşa Sûriyê de, di vê kefteleft û sergêjiya ku gelê Sûriyê tê re derbas dibe de, di vê tevlihevî û nelihevkirina rikberiya Sûriyê bi tevayî de, di jiyana tijî kuştin, xwînrêtin, kambaxkirin û tarûmarkirinê de. Tevgera Kurdî ji bo gengeşkirina doza Kurd û lihevkirinê civînên xwe bi neberpirsiyarî û bê encam derbas dike .

Di civînekê de, yek ji sekretêran rabû li ser rewşa ku heye bi tevayî û ya kurdî bi taybetî û pêdiviyên ku gerekî me Kurdan rawestî. Ji bo diyarkirina sedemên lihevnekirinê, wî tenê kêmanî di yên bilî xwe de dît û tu sûc nekir stûyê xwe. Yê duyem rabû li ser Desteya Kurd a Bilind axifî û hemî sûcên nevejîna wê xiste stûyê Encûmena Niştîmanî ya Kurd û pesna Encûmena Gel a Rojavayê Kurdistanê da. Yê sisiyan li ser peymana Hewlêrê ya dudiyan gotûbêj kir, çi li hev kirine û li ser çi li hev nekirine û biryarên hatine standin diyar kir. Sekretêrê çarê li ser rola Qendîlê û Hukumeta başûrê Kurdistanê sekinî, sipasiya başûr kir û Qendîl jî rexne kir. Hevserokekî jî di wê mijarê de pesna Qendîlê da û başûr lome kir. Sekretêrê pêncan nerazîbûna xwe ji "Xweseriya Demokrat" diyar kir û got: Ev xweseriya ji alîkî tenê ve hate nîşandan û em tê de ne hevpar in. Hevserokekî din jî di sebaretî xweseriyê de got: Ji ber ku ENKSê ne ya kar e, û pêwendiyên xwe yên taybet bi "Erdoxan" û kiwalisiyonê re hene, wê lomê tê de nebeşdar e. Yekî serbixwe ji ENKSê, piştgiriya şandeya Kurd li Cinêv(2) da xuyan. Nûnerê TEV-DEMê jî got: Ev şand bê me çûye 'Montiro', li ser erdê tuneye û nûnertiya gelê Kurd li rojava nake.

Bi vî rengî civîn hate domandin û kesî kizotê êgir nekir paşla xwe, hertim di ciyê xwe de dima, û gavek bi tenê jî ber hevdu navêtin. Lê, hemiyan jî xwe ji dûzanê nedixistin û bi yên derdora xwe re digotin: Lihevkirina me Kurdan di roja îro de bo me derman e, û yek ji sedemên têkçûna serhildan û şoreşên me yên dîrokî lihevnekirina me bû.

Li dawiyê endamek rabû ser xwe, sipasiya hewaldana hemî beşdaran kir û got: Birano! Hûn hemî li ser lihevkirina me tekez dikin, lê çima win li hev nakin, ez nizanim? Ez pir tênaghêm siyasetê , lê tiştê ez têdighêm ew e, ku em pirpeyv in, û weke gerînendeyê delûbê dimeşindimeşin û li dawiyê di ciyê xwe de dimînin. Kanî ez ji were bibêjim:

Birano! ji dêvla ku em bimeşin û ji nû ve li şûna xwe venegerin, bila em her yek gavekê ber ve yê din bavêjin û weke gerîna delûb nekin, herdem li dora xwe nezîvirin û gelê xwe jî bi xwe re sergêjkî nekin.

# Nav Giran e lê Mezel Wêran e!

Mihemed Bilo

Berî demeke nêzîk, ez tevlî korsekê li ser danasîna GENDER bûm, bi me re hejmarek ji rojnamevanên hin dezgehên ragihandinê jî hebûn. Mamosteya me bi ferehî li ser wê mijarê axivî û bi kûranî gengeşe li ser wê babetê hatin kirin. Nîvê wê hejmarê jin bûn û nîvê din jî mêr bûn.

Ezê li ser wê mijarê di vê gotarê de şîrove nekim, lê tenê ezê li ser xalekê ji wan waneyan bisekinim, ji ber ku ez xistim helwesteke bêpêşinde û teng!.

Mamosta me ya jêhatî di xelekekê de li ser rêjeya jinan di hin dezgehên opozîsiyona Sûrî de axivî, û di pê re wêneyek daxist ser ekranê û bi pênûsa xwe destnîşan kir, ku rêjeya nûnertiya jinan di Hevpeymaniya Niştimanî ya Sûrî ya hêzên şoreş û opozîsiyonê de ji sedî 17 in, û di Encûmena Niştimanî ya Sûrî de ji sedî 8 in, û di Encûmena Niştimanî ya Kurdî de ji sedî heft in!! Di cî de mamosteya me bi çavekî tijî heyf û mixabinî li min nihêrî, ji ber ku wê dizanîbû, ku ez Kurd im, di wê kêlîkê de gelek tişt hatin bîra min, gewriya min zuha bû, û her tişt li ber çavên min bûne mij, di wê kêlîkê de rewşa ENKSê hate bala min, û min di ber xwe de digot ax.. ax, bes bila tu zanibî ne tenê jin hatine dûrxistin lê Efrîn û Kobaniyê jî ciyên xwe di wê Encûmenê çerxûte de negirtin… Lê ji nişkave hiş hate serê min û min xwest ji bin barê xwe derkevim û min êrîş bir ser mamosteya xwe û gotê: Çima Tevgera Civaka Demokiratîk(TEV-DEM) te ne aniye zimên? Ango rêjeya herî bilind ji jinan li cem wan heye û sîstema hevserokiyê di cîhanê de tenê li cem me tê bikaranîn!

Sed heyf û mixabin, Dêmek rêjeya jinan di nav Encûmena Niştimanî ya Sûrî -ya êxwanande ji ya ENKSê pirtir e!?

## Geraca Nû li Bajarê Efrînê

Li roja sêşemê 24-2-2015an, geraca nû ya bajarê Efrînê, piştî nêzîkî deh mehan ji kar kete bikaranînê. Gerace ji alîyê şaredariya gel a bajarê Efrînê ve hat avakirin. Ew li aliyê pirê yê bakûr li ber perava Rojhilat ya çemê Efrînê dikeve. Armanaca wê kêmkirina pêgeha tirafîkî û hêsankirina karê barkirin û rêwîngiyê li bajarê Efrînê û di navbera wê û deverên Sûriyê yên de ye. Çend nivîsgehên rêwîngiyê û markêtên biçûk tevlî xwaringehekê jî tê de hatin vekirin. Bi rastî, ew ji piroje karekekî zor hêja û pêwîst bû.



Loma jî, ew ji hêla xelkê ve bi pesin û şahî hat pêşwazîkirin. Lê pêşniyar û hêviya wan ew e, ku deriyek ji bo kesên ku bi meşê diçin geracê, li nêzîk pirê li aliyê geracê yê Başûr were vekirin. Ji ber ku ew derî wê çûna xelkê hêsantir bike û buhayê gihîştinê jî sivik bike..

## Çilrojiya Heval Mihemed Seîd Huseynî




Roja Şemiyê 07.03.2015an, Rêxistina Qamişlo ya Partiya Yekîtî a Demokrat a Kurd li Sûriyê, çilrojiya hevalê hêja, buhuştî Mihemed Seîd Huseynî, li hola Şehîd Silêmanê Adê li Qamişlo li dar xist.

Di vê ahenga xemgîn de, ev gotinên jêrîn hatin xwendin:

Gotina dost û hevalên buhuştî, ji bal mamoste Mehmûd Umer ve hate pêşkêşkirin.

Gotinek ji bal mamoste Elî Cizîrîr ve hate xwendin.

Gotina Hevgirtina Jina Kurd ji bal mamoste Necah Hêvo ve hate xwendin.

Gotina Rêxistina Qamişlo ji bal hevalekî ve hate pêşkêşkirin.

Gotina malbatê, ji bal hevjîna buhuştî ve hate pêşkêşkirin.

Hin helbest derheqê vê bûyera dilêş de hatin xwendin.

Komîteya NEWROZê sersaxiyê ji malbata Seîd Huseynî re dixwaze û xwe hevparê derd û êşa wan dibîne. Bila cihê wî buhuşt be.

## Bi boneya 12 Adarê

Li roja 12yê Avdara sala 2004an, rêjîma Sûrî ya xwînrêj pîlanek li dijî kurdan pêk anî û nêzî 40 kesî jî li bajarên kurdî li Sûryê, ji Dêrîkê de û ta Efrînê hatin kuştin, bi sedan birîndar bûn û bi hezaran hatin girtin. Komkujiya 12yê Avdarê di bîra xelkê me de ye û jê naçe. Îsal jî, û piştî 11 salan ji wê komkûjiyê, gelê Kurd li Efrînê Şehîdên sala 2004an bi bîr anîn û bûyer û sazûmana Be`sî şermezar kir.

Bi vê boneyê bi deh hezeran welatiyên bajarê Efrînê, li kat 11, pênc xulekan bê deng li nava bajar, bajarok û gundan sikinîn û bi hildana alên Kurdistanê bûyer bi bîr anîn. Li devera Cindirêsê jî hevalên Partiya YEKÎTÎ bi awakî hevbeş li gel TEV-DEMê fêstîvalek li dar xistin, bone bi bîr anîn û şandeke hevbeş çû seredana gora pakrewan Ferîde li goristana gundê Miskê .

## Helebça li Efrînê

Li roja 16-3-2015an, bi boneya bîranîna komkujiya Helebçe, bi deh hezaran ji niştecihên Navça Efrînê, li kat 11, bi hildana ala Kurdistanê, pênc deqe bêdeng li ser giyanên şehîdên Helebçe û Kurd û Kurdistanê rawestîn. Bi hezaran dost û hevalên Partiya Yekîtî li hemî deveran di vê çalakiyê de beşdar bûn



" Şingirtina Helbçe li Efrînê "

# Bone û Çalakiyên li Avdarê



" Şahiya Cindirêsê"

Li meha Avdarê, gelek cejin û boneyên taybet digihên hev, wek Roja Jinê ya Cîhanî, 12 Avdarê ``Roja Pakrewanên Kurd``, boneya Şehîdên Helbçe, Newroz û H.W.D jî. Bi sebareta ewan boneyan, Partiya **Yektîtî ya Demoqrat a Kurd** li hemî deveran dest bi çalakiyan kir.

- **Bi boneya Roja Cîhanî ya Jinê.**

-Li 8-3-2015an, û bi boneya Roja Jinê ya Cîhanî, rêxistina jinan a Partiya YEKÎTÎ şahîyek li hola Jîn-Efrîn li dar xist. Hol bi wêneyên hin jinên Kurd ên navdar, nîşana partiyê û ala Kurdistanê hate xemlandin. Şahiyê bi kêlîkek bêdeng li ser giyanê pakrewanên Kurd û Kuedistanê û sirûda Ey Reqîb dest pê kir. Pişt re, du gotin li derbarê boneyê hatin xwendin, yek a Encûmena Niştîmanî a Kurd li Sûryê, ya din jî ya partîya YEKÎTî bû, tê de jin hatin pîrozkirin û li ser girîngiya karê hevbeş di navbera jin û mêrê Kurd de ji bo avakirina çivakeke demokrat û azad tekez bû.

-Li deverên Cindirêsê, Şîyê, Be`dîna û Kêla, çalakiyên taybet li darketin. Jinan û berpirsiyarên partiyê li wan şahiyan gotin kirin, tê de dilşadiya xwe xuya kirin û soz dan ku ewê ji bo biçihkirina mafên jinê karê xwe berdewam bikin, ta çivakeke şaristanî li ser bingeha dadmendî, wekhevî û azadî ava dibe, û mirovê kurd jî li ser bêngeha zanebûn, xwendin û pîşketinê jiyana xwe ava dike.

**-Girkê Legê**:

Li 6-3-2015an, bi boneya Roja Jinê ya Cîhanî, şandekê ji rêxistina Girkê Legê seredana navenda (Yekîneyên Parastina Jinê) " YPJ" kir, şande bi coş û bi tewreyeke germ ji hêla navendê ve hate pêşwazîkirin. Şandeyê cejna şervanên "YPJ" pîroz kir, tekoşîn, berxwedan û qurbaniyên wan bilind nirxand, û ew vexwendin ahenga vejandina Roja Jinê ya Cîhanî.

Li roja 7-3- 2015an jî, Koma Ronahî ya Folkilora Kurdî, bi wê boneyê li navenda partiyê li Girkê legê ahengek li dar xist. Ahengê bi rawestina xulekek bêdeng li ser giyanê pakrewanên şoreşa sûriyê û yên Kurd bi taybetî pakrewanên berxwedana Kobanê dest pê kir, her du pêşkêşvanên ahengê (Niştiman Yaqûb û Dilvîn Hesen) bi xêrhatina mêvanan kirin û cejna jinê li wan pîroz kirin. Ev gotinên jêr di ahengê de hatin xwendin:

1- Daxuyaniya komîta rêzanî ya partiyê bi boneya (Roja jinê ya cîhanî) ji hêla mamosa Elî Elî ve hate xwendin.

2- Gotina rêxistina jinê ya Girkê Legê ji hêla hevala Dilvîn Elî ve hate xwendin.

Di ahengê de çend jinên Kurd ên ku roleke balkêş di warên xebata rêzanî, civakî û çandî de li herêma Girkê Legê dilîzin, hatin xelatkirin. Pêşbaziyeke çandî jî ji jinan re hate amadekirin, û diyarî li yên serkeftî hatin belavkirin. Du birûskên pîrozbahiyê jî gihîştin ahengê; yek ji ``Dîdargeha Girkê Legê ya rewşenbîrş`` û ya din jî ji ``Partiya Komonîst a Kurdistanê``, herweha şandek ji (Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûryê) jî li ahengê beşdar bû.

Li dawiyê, spasiya Asayişa Girkê Legê hate kirin, wekî ku erk û stûbarên xwe bi rêkûpêk di ber parastina ahengê û cemawer de kir.

**- Tirbespiyê**:

Bi helkefta Roja Cîhanî ya Jinê, roja Înê 7/3/2015an Rêxistina jinê li Tirbespiyê ya Partiya Yekîtiya Demoqat a Kurd li Suriyê ahengek li dar xist.

Li destpêkê, bixêrhatin û pîrozkirina vê rojê li tevaya jinên cîhanê û bi taybetî li jina Sûrî û ya Kurd hat kirin, pişt re, demek bê deng li ser giyanên pakrewanên Kurd û Kurdistanê hat rawestin.

Gotina rêxistina jinê li Tirbespiyê hate xwendin, di pey re hevala Edla Umer, endama navça (Qamişlo - Tirbespî) gotinek ji beşdaran re pêşkêş kir, tê de li ser wateya roja jinê ya cihanî axivî, û hin nimûne ji jinên Kurd ên navdar bi bîr anîn, wek (Edla Xan- Leyla Zana – Leyla Qasim – Arîn û Viyan Dexîl...û H.W.D), û rola jinê di jiyanê de û erkê wê yê civakî û siyasî anî zimên.

Hin helbest jî hatin xwendin, û li dawiyê pêşbirkek pêk hat û xelat jî hatin belavkirin.


" Roja Jinê ya Cîhanî li Tirbespiyê "

# Bîranîna Nivîskar û Rewşenbîrê Kurd ê Naskirî Rezoyê Osê

■ Newafê Bişar

Di pêncemîn salvegera Koçkirina Nivîskarê Kurd Rezoyê Osê de, beyaniya îro 04.03.2015an, çend rewşenbîr û hezkerên Rezo, gurzek gul bi navê Kovara PIRSê bi xwe re birin û serdana gora wî li gundê Degşûriyê kirin. Ew ji bala malbata wî ve hatin pêşwazîkirin..

Herweha bi vê helkeftina dilêş, li demjimêr 4ê piştî nîvro, Yekîtiya Nivîskaran li bargeha xwe, li Bajarê Qamişlo semînerek li dar xist, birek helbestvan, nivîskar û berketiyên zimanê Kurdî lê beşdar bûn, û hin gotin û helbest hatin xwendin.

Di wê semînerê de, ev gotina li jêr, ji bal kek Newafê Bişar ve hate xwendin:

**Di Bîranîna REZOYÊ OSÊ de**

**Du Gotin û Gulek!**

Komîteya amadekar.. Xwişk û birayên rêzdar…

Mîna rewşenbîr û nivîskarekî zimanê Kurdî, min navê kek Rezoyê Osê bihîsti bû, lê ji nêzîk ve me hev nas ne dikir û tu têkiliyên me bi hev re tunebûn.

Di civîna nûnerên Kovarên (Gelawêj, Stêr û Rê), ya bi armanca yekirina her sê kovaran di yeke nû de, ku roja 27.09.1992an li Qamişloyê li dar ket, cara pêşî bû me hev nas kir. Piştî wê civînê, bejna wî ya wêjeyî, sinciyên bilind û nirxên wî yên Kurdewarî û mirovheziyê ji min ve diyar bûn, û her dem derbas bûye, têkiliyên me xurtir bûne, em bêtir nêzîkî hev bûne. Ji wê rojê, û ta roja reş a koçkirina wî ya dawîn 04.03.2010an, di desteya Kovara PIRSê de, mil li



mil, li gel hemû endaman em bi hev re xebitîne, û geh li herêma Cizîrê, li Helebê, û geh li herêma Efrînê bi dilgermî û geşbînî me civînên komîteyê gerandine û kovara xwe weşandiye.

Bê guman e, ku kesên hişmend, zana û bîrewer, ji civaka xwe re semyanine giranbuha ne, çiku her ew riya qenciyê nîşa gelê xwe didin, di ber hebûn û rûmeta wî ya netewî de, bê dudilî, ew berevaniyê dikin. Ji ber vê hindê jî, dema ku ew kes çavan digrin û bar dikin, civak xemgîn dibe, reş girê dide, û rondikên dilsoziyê li ser wan dibarîne. Lê, li gor yasayên jiyan û xweristê, bi demê re, birîn qeşmûşk digrin, civak xwe nû dike, lehengine nû diafirîne û her jiyan berdewam dibe.

Bi saya xebat û cefakêşiya hemû kesên ji bo zimanê Kurdî û nirxên Kurdayetiya rasteqîn têkoşîn kirine, îro, bi dehê hezaran keç û lawên me li Cizîrê, li Kobanê ya birîndar û Efrînê, rastiya xwe nas kirine, bi dilgermî ziman, çand û zargotina gelê xwe hembêz kirine, û lê xwedî derketine. Ew bi Kurdî dixwînin, bi Kurdî dinivîsin, bi Kurdî diramin û dijîn, û mîna hemû gelên cîhanê ew xwe bi zimanê dayîka xwe şanaz, bextewer û serfiraz dibînin.

Di rewşeke ewqas têkilhev, aloz û awarte de, di van merc û hoyên pir dijwar ku gelê me têre derbas dibe de, erk û ustubarên nivîskar, rewşenbîr, siyasetvan, mafnas û hemû qat û pêkhateyên civakê ew in, ku ew civaka xwe ji herifandin û perçebûnê biparêzin, hevrêzî û çanda ji hev hezkirinê bi firehî belav bikin, ji ber ku çendî em rêz û rûmeta hev nas bikin, ewqasî civaka me xurt û berxwedêr dibe.

Di pêncemîn salvegera koçkirina nivîskar û rewşenbîrê Kurd ê dilsoz, berketî û xemxwarê zimanê Kurdî Rezoyê Osê de, hem bi navê xwe, û hem jî bi navê Desteya Kovara PIRSê, gurzek gul, nêrgiz û kulîlkên rengîn diyarî giyanê wî yê pîroz dikim, û tekez dikim ku mirovên mîna Rezoyê Osê dê her di bîra gelê xwe de zindî bimînin û tu carî ew namirin!.

**… 04.03.2015**

## Mehrecaneke Helbestî

Bi boneya hatina meha Avdarê û serkeftina hêzên kurdî li Kobanê , komîta amadekar a Roja Helbesta Kurdî du aheng li navça Efrînê li dar xistin; ahengek li hola Jîn-Efrîn li roja 18-3-2015an li dar ket, ya din jî li roja 20.3.2015an li Navenda Çand û Hunerê li bajarokê Cindirêsê li dar ket. Bi dehan helbestvan rewşenbîr, çalakvan û sîyasetmedar lê amade bûn, û helbestên welatperwerî bi hestên nazik û bilind gotin. Tê de berxwedana qehremanên Kurd li Kobanê û li seranserî Kurdistanê kirin rêç ji jiyan û paşeroja gelê Kurd re.

# Istenbûl ....

**Alan Bêwar**

bajarê bi qerez çêkirî
girêk û xeleka wendahiyê...
li kolan û taxên te geriyam
bi kevokên te re firiyam
di nav wêneyên te de
min rengê xwe ne dît.....
giraniya dîroka navê te
xweşiya hebûna te
çavên min têr ne kirin......
di nav girseya vedenga te de
hênkahiya Çayê Kurmênc .....
min xulmaş dike.......
bayê biskan û awirên rûgeşan
ez ji rê nexistim.....
bala min ne zîvirandin
ji evîna Erenda çavbelek
tevliheviya ciwantiya te
hestên min ne dizîn.....
pêl û tajanên min kedî ne kirin....
çivîkên xemgîn ne firandin
birînên hilgirtî ne kewandin....
Istenbûl......
xweşî û hebûna te; ya te ye
keder û hesretên min; ên min in

**Istenbûl ...13/3/2015**

# Evsana evînê

**Zeredeşt Mihemed**



Naz û rind e gula gund e
Dêm buhar e keça kurd e
Bejin ji rimê bilind e
Ronî ji fener û find e
De were carek bi vir de
Min azad ke ji derda
***
Keç.. şêrînê.. hingivînê
Lêv erxewanê ji xwînê
Wateya min ser zemînê
Ken ji evsana evînê
Bi xemlê tu ne kêmî Zînê
Bo te Mem im li vê jînê
***
Zerî boz e ji min re doz e
Berfa sipî li ser zoz e
Rûbar in bisk li ser singa
Bîn ji şîrav û lîloz e
Çi dem soz e dîlbera dil
Jîn di gel şox û newroz e
***
Keça şirînê xemrevînê
Vejîna rewan û jîn e
Ger bi şengî tu pir çeleng î
Ji naz û xemla şirînê
Bi dilsozî ez lawê kurd im
Ferhad im mîrê evînê

**Libnan – 2011**

# Newroza me! ....

**M . Elî**

ji hezar salan de
mîna nasikekî reben
her sal
li ber dergeha te ya bilind
radiwestin
û rojexewnên bervemirî
bi agirê te yê pîroz
vêdixim û vedijînim
û dîsa radibim
Kumê Qulik didimê
û li ber kutkuta dilê evîndarên te
dîlana xwe
wek sewdaliyekî
li çar aliyan
û bi çar rengan digerînim

**.. 20.3.2015**

# Nivîskara Kurd Drriye `Ewnî

Li roja Yekşemê 22.3 2015an, li paytexta Misirê –Qahîra-, piştî çend mehan ji nexwaşiyê, mirinê nivîskara Mesirî ya Kurd Drriye keça Mihemed Elî `Ewnî jî ji nav me bir.

Zanayê Kurd Mihemed Elî Ewnî li Amedê ji dayîk bûye. Li serdema Osmanî hat li misirê rûnişt û li ba Xwedêwiyên Misirê bû nivîskarê dîwanê yê taybet, û li sala 1952an çû ser qedera xwe. M.E.`Ewnî bi jineke Misrî re zewicî bû, sê zarok jê bû bûn, yek Durriye bû, didu jî kur bûn Selahiddîn û endezyar `Îsam.

Durriye li Misirê li dibistanên Ferensî xwend. Piştre çû li Firensa xwendina xwe ya zanîngehê kuta kir ,û di Wekaleta Nûçeyan a Firensî de karê rojnamgeriyê kir. Li wan deman ew bû berpirsyara Sendîka Rojnamevanên Firensî jî.

Bi sedan gotarên Durriye Xanimê di rojnamegeriya firensî û erebî de hatin belavkirin. Tê de berevaniyeke zor hêja ji ber pirsa kurdî de dikir û xelk bi zana, rewşenbîr û navdarên Kurd da naskirin. Ji bilî ku du pirtûk jî bi navê wê derhatin; yek bi navê ((Kurd û Ereb: Dostanî Lê Dijmanî)), ya din jî (( Kurd li Misirê li Dirêjiya Serdeman)), tê



de hebûna Kurdan li Misirê û rola wan di avakirina Misirê û geşepêdana wê de da nasîn.

Sersaxî ji mal, gelê Kurd û Misirî û hemî berketiyên Durriye Xanim re.

Zanîn ji: PUKmedia

# Hawara Jinên Azadîxwez

■ **Vejîna Kurd**

Şiyan û kanîna jinê, hemû nêrîn û ramanên ku jin wek zayendeke kêm di civakê de destnîşan kirine li erdê dixin.. Jina ku ji destpêka dîrokê de li rex mêran karûbarên civakê rakirine, kane bi hemû stubariyên xwe bi serkeftî rabe. Lê gava jin berevaniya hebûn, azadî û mirovatiya xwe dike û doza mafên xwe yên rewa dike, ew nayê wateya ku ew mêran gunehkar, yan jî rêzê li rola wan nagire û ji paya wan kêm dike. Berûvajî wê, jina zana û têgihîştî, ji mêran re, li dijî zordariyên li ser jînê alîkar e, ji ber ku rola wê di pêşketina mirov, malbat û civakê de zor girîng e

Jin hêlîna berdewamiya mirovahiyê ye, û di hembêza wê de, gava yekem ji avakirina kesayetiya nifşan dest pê dibe. Lê mixabin, di çerxa bîst û yekê de, hîn di hin civakan de, jin ji zordarî, serweriya nêremejî û nezanînê dinale.

Jin li rex mêran rewşên aborî yên gelek xirab diborîne, û pir caran digihê asta xizaniyek dijwar. Ew jî bandora xwe ya neyînî li rewşa jinê ya civakî û çandî dike, û dibe sedema paşdemayîna wê jî. Li aliyekî din, nexweşiyên civakî yên ku cihê xwe di nav civaka me de girtine, û pir zor e jî ku bi hêsanî werin rakirin, ew jî bandora xwe li derûniya jinê dike, û doza wekheviya di navbera mêr û jinê, ku tê kirin, wê bi paş dixîne.

Ji ber wê jî, xweavakirina jinê di warê aborî de, xwerizgarkirina wê ji wan nexweşiyên civakî, gava yekem û durust e ji vê pirsgirêkê re.

Jin nîvê civakê ye, û çênabe ku ew nîv ji aliyê serweriya mêran de were pûçkirin, û li aliyê din, divê jin jî bi wê nêrînê li xwe mêze neke û nepejirîne, divê ew asta xwe ya zanîn û rewşenbîriyê bilind bike.

tevlî ku di van salên dawî de, jinê di pir waran de gavine baş avêtine, lê hîn pir malbat xwe ji nexweşiyên civakî rizgar nekirine, ew jî cihê mixabîniyê ye. Ji ber wê jî, pêwîst e, ku bendewarî bi alîkariya jinan hebe.

Çanda nêremejitiyê ku gelek cure û şêweyên zordariyê li dijî jinan bi kar tîne, divê ew ji nava civakê rabe. Ew yek ji avakirin û pêşketina şaristaniya mirovatiyê re kelem û asteng e.

Bêguman, pir nexweşiyên civakî yên ku kesayetiya jinê tepeze dikin, divê sedemên wê werin naskirin, û çareserî ji wan re were danîn. Ew jî ji erka zanyar û komeleyên civakî ne, û saziyên dewletan jî di ber berpirsyar in.

# Penaberî .... Wêrankirina Civakê!



▪ M. Elî

Li gora serhejmarên navdewletî, di encama şerê navxweyî de ku li Sûryê dibe, dora yanzde milyon welatî malên xwe hîştine û mişext bûne. Ji wan derdora heft milyonan di nava sînorên Sûryê de mane, û li kû derfet û pêdvî ji wan re peyda bûne, lê rûniştine. Bêtirî pênc milyon kes jî bi paş sînoran ketine, û xwe spartine rêxistnên Yekîtiya Netewan, yan jî li bajarên dewletên derdor belav bûne, cihên kar û rûniştinê ji xwe re peyda kirine û jiyana xwe berdewam dikin.

**Kurd jî bûne penaber …**

Di gel ku Kurd ji destpêkê de ne ketin nava şerê navxweyî ku li Sûryê dibe, lê belê ew ji felaketa wê xelas ne bûn, cih û warên wan jî wêran bûn û toşî hêrişên giran bûn. Di encama wê de bi sed hezaran ji Kurdên bajarên Sûryê yên mezin, neçar bûn ji malên xwe hilbin û mişext bibin. Hejmara mezin ji wan arzû û her tiştên xwe li şûna xwe hîştin û berê xwe dan navçeyên xwe yên kurdî yên resen. Lê belê dema ku debara jiyanê li wir ne bû, piraniya wan, li gel hejmarine mezin ji niştecihên navçeyên kurdî bi xwe jî, berê xwe dane sînoran û mişextî bûn. Beşê mezin ji wan, ango dora sê sed hezar derbas Herêma Kurdistanê bû. Piraniya wan di kampan de bi cih bûn, lê hejmarine mezin li nava bajaran rûniştin û karên ku peyda dibin dikin. Kurdên ku derbas Tirkiyê û Libnanê bûn, ew jî, bi tevahî li bajaran bi cih û kar bûn. Ji bilî wan, bi deh hezaran kes û malbatên Kurd berê xwe dane dewletên Yekîtiya Ewropa, û li wir doza mafê penaberiyê dikin.

Digel goçkirineke pir mezin , dibe, lê hîn jî tu amar li derbarê hejmara pênawrên Kurd, çi yên hundir û çi yên derve, nehatine naskirin, lê guman heye ku hejmara wan, li gel xelkê Kobanê ku di encama hêrişa têrorîstan de ji welêt derketin, wê milyonek derbas kiri be û digihê derdora % 33 ji tevahiya hejmara kurdan li hersê navçeyên kurdî li Sûryê, û derdora %10 jî ji tevahiya hejmara penaberên Sûrî dike.

**Welat vala dibe…**

Li gora ev serhejmarên nêzerast, diyar dibe ku ji her sê kurdan kurdekî welat hîştiyê û bi derveyî sînor ketiye, ew jî hejmareke pir mezin e, û metirsiyeke rastînkî û zor buveh li ser paşeroja gelê Kurd û xaka wî ya dîrokî peyda dike, û dihêle ku mirov destê xwe dîne ser dilê xwe û deh caran li eniya xwe bide. Nemaze jî gava mera dibîne û bawer dike, ku piraniya pir ji ew kesên ku diçin, wê careke din venegerin.

Ji bêtirî heftê salî de, ango ji destpêka serbixwebûna Sûryê de, hewildanên pişaftinê yên piralî û pirereng ji aliyê destlat û rayedarên Sûryê de li dermafê gelê Kurd dihatin kirin. Rêbaza siyaseteke helandin û goçkirinê ye bi rêkûpêk dihat meşandin, armanca wê ya bingehîn ew bû, ku navçeyên Kurdî ji kurdên wê vala bibe, wê radestî kesine din bikin û yekcar ji Kurdan û pirsa wan xelas bin. Pirojeyên mîna `` Kembera Erebî `` û ``serhejmara awarte``, di çarçewa wê siyastê de hatin danîn û pêkanîn?......

11

**Newroza Pakrewanan.. Dûmahîk**

Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd nama salane ya newrozê belav kir, tê de nêrînek tevahî li ser rewşên Sûryê û gelê me yê Kurd da xuyan. Emê cend xalan jê bewşînin:

(( Ji çar salan ve xelkê Sûriyê şoreşa xwe bi siloganên aştiyane ji bo azadî û rûmetê -weke dastana Newrozê- dest pê kir. Lê, desthilatdara setemkar kanî bi hewildanên xwe hin rikberên xwe bi çekan bi xwe re rûbirû bike, û wê bike behaneya bikaranîna hemî cûreyên çekan li dijî gelê xwe û welatiyên bêguneh jî baceya wê bidin.

Ta niha rikberên Sûriyê di nav xwe de perçekirî û nakokdarên hev in, hewildanên lihevkirina wan di çarçeweke niştimanî sûrî de encam dane. Lê, li ser zemînê roj bi roj girûpên terorîstan berdewam û fere dibin û destên xwe datînin ser rûberên mezin ji welêt û wêran dikin, rizgarkirina wan deveran û jinûveavakirin jî wê pir ked qurbaniyan bixwaze, weke çawa li vê dawiyê Kobaniyê û gundewarên wê bûye, û ta niha jî têrora wan li rojava û başûrî parêzgeha Cezîrê berdewam e. … dema ku mal û milkên xelkê dibe armanca çekên giran, bi milyonan ji xelkê Sûriyê mal û cîwaran li şûn xwe dihêlin, penaber û koçber dibin, û di kongehên bêrûmetî, xizanî û penaberiyê de -çi li hundir û çi li welatên derdor- bi cî dibin.

Bi rastî tiştê li Sûriyê çêdibe di ser kanîna mirovan re ye, rawestandina herkandina xwînê û bi dawîkirina tundûtûjiyê di riya çareseriyeke siyasî û danûstandinî re bûye erkeke niştimanî. Pêkanîna wê jî di riya çarçewekirina hemî hêz û aliyên sûrî yên niştimanî re ye, û lihevkirina wan li ser pirojeya distûrekê, tê de azadî û mafên hemî pêkhateyên sûrî parastî bin. Ya girîng ji bo kurdan jî -weke miletekî ku ji dehsalan de zilm û zor dîtiye- ev e: Dazanîna fermî bi taybetmendiya gelê me yê Kurd û mafên wî yên rewa di siya sazûmaneke nenavendî, piralî û demokrat de. … Bi rastî ciyê mixabiniyê ye, ku bi çarenûsa lêvegera siyasî ya kurdî bê lîskandin û geşkirina wê were bi şûnxistin -weke niha çêdibe- û bibe dîla merc û mîzacên kesane û partiyane, weke ew çawa berê jî bûn kelem li pêş pêvajoya Desteya Bilind a Kurd û pûç kirin.

Di dema ku em bi boneya cejna Newrozê ya pîroz, xort û keçên gelê xwe yê Kurd yê rûmetdar pîroz û silav dikin, em bira û xwîşkên xwe yên sûrî li hemî herêman ên ku merc û êşekên zor û zehmet dibînin jî bi bîr tînin, û wan silav dikin. Û em li ber giyanê pakrewanê Newrozê yê yekem (Silêman Adê-Şam 1986), giyanên pakrewanên Yekîneyên Parastina Gel û hemî şehîdên Kurdistanê û azadî û rûmetê bi rêz û rêzdarî rêzê digirin.

-Bijî Newroz şana azadî û biratiyê.

-Her Newroz hûn di xêr û xweşiyê de bimînin.

18.03.2015Z – 2627 k

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê.**

**Penaberî ... Dûmahîk**

**Mixabin!**

Lê zor mixabin! tiştê ku di heftê salî de bi zora siyasetên şoven pêk ne hatin, roja îro bi dest û vîna mirovê Kurd pêk tê. Dema ku kurdek warê bav û bapîrên xwe berdide û ji welêt derdikeve, bê guman û wekî ku em her roj dibînin, kesine ji netewene din, tavilê û bê erêna, şûna wî digirin. Ev rastiyek e, her kes dizane û li her katekê li bajarên kurdî tê kirin. Erê rast e, ku rewşên giştî pir awarte ne û jiyan li mirovê Sûrî teng bûye, lê li aliyê din, rewşa kurdan pir nazik, hestewar û awarte ye jî; roja îro hebûn û tunebûna miletekî û welatekî ketiye ber ezmûneke dîrokî. Dema ku tu niha li nava bajarên kurdan digerî, tu kesine din dibînî û zimanine din dibihîsî. Zor mixabin! Gelek caran, bûk û zaveyên nû kelûpelên xwe li ber dîwaran bi buhayê “paseportekê” difiroşin. Erê rewşa mirovê Sûrî ji hemî aliyan de dijwar e, lê gengazî û derfetên jiyaneke ku were pejirandin hîn li nevçeyên kurdî hene û kes ji nêza re namire. Pir pêwîst û giring e ku mirovê Kurd li hember hemî dijwariyan li ber xwe bide û xwe ragire. Yan jî emê neçar bibin bêjin: **Bapîrên me! em ji we bi fedî ne.. axa ku we bi hezar salan parast, em niha bi erzanî ji dest xwe didin!!??.**

# Yeşar Kemal! Çû Ser Qedera Xwe!!

Dr.Mihemed.E.Elî

Li roja 1.3.2015an, mirinê nivîskarê Tirkiyê yê Kurd Yeşar Kemal, di temenê 84 saliyê de bire ser qedera wî.

Wekî ku ji devê Yaşar Kemal bi xwe hatiye birin, ew ji dê û bavekî Kurd bûye. Malbata wî ji gundekî ji derdoara Wanê hatiye li Edenê rûniştiye û li wir jî mezin bûye.

Yaşar Kemal di gelek warên nivîsê de xebitiye, lê ew di nivîsa romanê de navdar bûye. Romana wî ya bi navê "Înce Mêmed" - Memedê jar- ku ji çar cildan pêk tê, ew gihand asta nivîskarên cîhanî û karên wî bi çel zimanî hatin wergerandin.

Y. Kemal tenê du salan ji Tirkyê dûr ket û çû li Siwêdê bi cih bû, ew jî ji ber egerên siyasî bû. Wî tenê bi du zimana zanî; Tirkî û Kurdî, lê bi zimanê Tirkî dinivîsand. Ew li derbarê wan her du babetan wiha dibêje: ((Ji bilî zimanê dayîkê bi tu zimanên din menivîsin, ji ber ewê ji kûraniya dilê te derdikeve))… ((Tenê li ser kesên ku tu baş nas dikî.. li ser xelkê xwe, welatê xwe… binivîse))… ((li welatê xwe bimînin… goç mekin û meçin li Rojavayê``Ewropa`` mejîn…)).

Y. Kemal di salên bîstan de ji temenê xwe bû endamê Partiya Komonîst ya Tirkî, wê yekê, rêça nêrînên wî yên siyasî û civakî di hemî warên jiyana wî de neqişand.

Y. Kemal çend caran wek namzetê xelata Nobilê hat pêşniyarkirin, lê mixabin ew bi dest



neket. Hin çavdêr dibêjin, du meraq bi Y.Kemal re çûn gorê, yek: Xelata Nobilê, ya din jî çareserkirina pirsa Kurd li Tirkiyê bû.

Rojnama "Lîbirasiyon" a Firansî li sala 1995an hevpeyvînek bi Y.Kemal re kir, rojnama Elsefîr a Libnanî jî di hejmara 27 -1-1995an de wergera bi Erebî belav kir. Li wê çaxê, rojnama me "Newroz" ew hevpeyvîn wergerandi bû kurdî û belav kiri bû. Ji ber giringiya zanînê ku tê de hatine û ji bo naskirina gelek tiştan li ser helwest û jiyana Y.Kemal, emê çend pirs û bersivan jê biweşînin:

***P- Pirsa Kurdî û tunebûna dîmoqrasiyê li Turkiyê, du kêşên kevin in, çima tu niha li ser wan germbûyî û dinivîsî..?***

*B= Wêrankirina gundan û valakirina ku bi darê zorê li başûrê Rojhilata Anadolê dibe, ez pir êşandim. Ez Kurd im û navçê jî baş nas dikim, ji ber ku, ez bi xwe ji wir im. Dixwazim dawiya vî şerî were, û xwînrêtin nemîne. Ez hew kanim lorîna, dayîkên şerbazên Turkan û çekdarên Kurdan bibhîsim...*

***P- Bi ya te be, ev şerê ku li Rojhilatê Başûrê Turkiyê dibe, çima berdewam e?***

*B= Ji ber ku, mafên Kurdan ji heftê salî de hatine birin, li Başûr Rojhilat û li Rojhilata Anadolê, bi miliyonan navê cihên Kurdî hatine guhartin. Ma ne ji mafê bavan e, navên Kurmancî li zaroyên xwe bikin?. Û eger yek zimanê Turkî baş nizani be, ji cihên gelemper û dadegehan tê qewtandin. Ji heftê salî de, zoreke hovane li ser zimanê Kurdî û Kurdan heye. Di warê aborî de, berê jî û hertim, deverên Kurdan perîşan in, du hezar gund hatine şewtandin, di ser miliyon û nîvek Kurd re neçar bûne, cihên dê û bavên xwe berdin, û êşandin bi rengekî rêk û pêk dibe. Loma jî xort bi çiyan dikevin û dibin şoreşger.*

***P- Ma tu ji koka xwe de Kurd î ?***

*B= Belê, ez di malek Kurd de bûme. Pişt re me barkir û em hatin Kîlîkiya. Me li mal bi Kurmancî deng ne dikir, û tevî ku bavê min nivîskarê dadgehê û zengîn bû jî, lê ew bi Rêzdar Sadiq bi nav ne dibû, bi Sadiqê Kurd bi nav dibû.. Hîn Kurdên ku dihatin seredana me û bi heftan li mala me diman li bîra min in. Li destpêka salên pêncî, gava ku min di çarçewa çapemeniyê de dest bi karê rojmanevaniyê kir, ez bi Kemalê Kurd dihatim naskirin...)).*

Hêjayî gotinê ye, ku Y.Kemal du caran zewiciye, jina yekê bi navê Yêlda Sîrêro bû, ew neviya bijîşkê Silatan Ebdilhemîd ê taybet bû. Ew pêncî salî bi Y.Kemal re jiya û rola wê di navdarbûna Y.Kemal de pir mezin bû. Piştî ku xanim Yêlda mir, ew bi xanim`Eyşe Semîh Baban re zewicî, ew jî ji malabateke kurdî ye bi nav û deng e.

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**

Êmêla Newrozê:
Newroz@yek-dem.com